HÛN BI XÊR HATI HÊLÎNA ME

BI HEV RE PARASTINA JI ENFEKSIYONAN

Li gorî maddeya 34, rêza 5, rûpel 2 a qanûnê agahikirina malbat û kesên ji mezinkirina zarokan berpirsyar
Qanûna parastina ji enfeksiyonan

Deverên raya gişti, mîna hêlina zarokan, dibîstan û cihên betlanê, gelek mirov heman cihî bi hev re parve dikin. Lewra nexweşixên enfeksiyonan dikarin bi hêsanî li van deveran belav bibin. Bi vê sedemê Qanûna parastina ji enfeksiyonan ji bo pêşîgirtina belavbûna nexweşiyan û ji bo parastina zarok û xebatkarên saziyên raya gişti hin rêzik amede kirine. Em dixwazin di derbarê vê de bi broşûrê we agahdar bikin.

1. Qanûna qedekirina serdanan

Qanûna parastina ji enfeksiyonan dibêje; ger zarokek bi enfeksiyonê re girêdahî bi hin nexweşiyan ketibe, ango hin gumanên nexweşiyan pê re hebe, divê neçe hêlinê, dibîstanê û deverên din ên bi ku hev re tê bikaranîn. Ev nexweşî di rûpela din de, di Tabelleya 1'î de hatine rêzkirin.

Hin enfeksiyon dibin sedem ku zarokê/a we ji ber hin organizmayan nexweş bikeve (kêm be jî carna dikare nexweş nekeve). Di rewşên wisa de hevalên wê/wî yên lewstikê, hevalên wê/wî yên dibîstanê ango xebatkar dikarin van enfeksiyonan bigrin. Lewra li gorî qanûna parastina ji enfeksiyonan, kesên ku bi van bakteriyan ketine tenê dikarin bi destûra Daîre Tenduristiyê û di çerçova tedbîrên hatî standin de, dikarin herin deverên ku bi hev re tên bikaranîn. (Tabelleya 2'an a rûpela din)
Ji ber hin nexweşiyên enfeksiyonan ên dijwar û taybet, divê zarokê/a we li malê bimîne, ger li malê kesek bi van nexweşiyên enfeksiyonê ketibe ango gumana nexweşiyê li ser hebe. (Tabelleya 3'an a rûpela din)

Bêguman hûn ne mecbûrin bi serê xwe van nexweşiyan nas bikin. Lêbelê pêwiste dema zarok bi nexweşiyekî ciddî ket, divê hûn pêşniyarên bijişkan pêk bînin. (Minak; hararetê dijwar, pir westanbûn, duberekirina verişandinê, virîk û rewşên ne normal û derveyî rêzê) Pijişkê/a zarokê/a dê ji we re bêje ka zarokê/a we nexweşe an na. Qanûna parastina ji enfeksiyonan dest nîşan dike ka kê dikare here deverên ku bi hev re tê bikaranîn.

Li hember hin neweşiyan derzî (aşî) hene. Ger zarokê/a we hatibe aşî kirin, wê demê Daîreya Tenduristiyê dikare destûra çûyîna deverên bi hev re tê bikaranîn, bide.

2. Bepirsyariya agahdarkirinê

Ger zarok ji ber sedemên ku hatî gotin, çûyîna wî ya deverên bi hev re tê bikaranîn hatibe qedexekirin, ango bi van nexweşiyan ketibe,

Ein Kooperationsprojekt von:
AWO Landesverband Brandenburg e.V.
Landkreis DAHME-SPREEWALD

Unterstützung und finanzielle Förderung:
LAND BRANDENBURG
Ministerium für Bildung, Jugend und Sport

pêwiste hûn yekser me agahdar bikin. Herwiha hûn jî mecbûrin bi me re li gorî tedbîrên ku ji aliyê Daîreya Tenduristiyê ve hatî girtin, tev bigerin.

3. Pêşîgirtina nexweşiyên ku zû belav dibin

Li gorî qanûna parastina ji enfeksiyonan deverên bi hev re tê bikaranîn, li ser pêşîgirtina nexweşiyên ku zû belav dibin, neçarin agahiyan bidin.

Lewra em ji we re pêşniyar dikin ku zarokê/a we divê li gorî rêzikên paqijiyê tev bigere. Ji bo vê jî divê berî her tiştî pêşiya xwarinê, piştî çûyîna tuwaletê û livbaziyan bi awayekî rêkûpêk dest werin şûştin.

Herwiha ya herî girîng jî divê zarokê/a we hemû aşiyan kiribe. Aşîkirin jî dikare pêşiya hinek ji van nexweşiyan bigre, ku bi rêya bêhnstandinê belav dibin û bi rêya paqijiyê nikarin werin asteng kirin. (Mînak; sorik, gurep û xurisorik). Agahiyên berfireh ên di derbarê aşiyan de hûn dikarin ji vê malperê werbigrin: www.impfeninfo.de.

Ger pirsên we yên din hebin, ji kerama xwe re serî li pijişkê/a zarokan ango pijişkê/a malê bidin, yan jî biçin Daîreya Tenduristiyê. Herwiha em jî dikarin bi keyfxweşî alîkariya we bikin.

Tabelle 1: Bi van nexweşiyan ango bi gumana van nexweşiyan hûn nikarin biçin serdana deverên bi hev re tê bikaranîn û hûn mecbûrin agahî bidin:

- Împetigo-Nexweşiyek çerme (Impetigo contagiosa)
- ku zû belav dibe
- Bakteriyên êşa zêra (Shigellose)
- Kolera
- Îltihaba rûviyan (Enteritis), ku EHEC dibe sedem û piştre dibe
- Diphtherie
- Vîrusên A ango E dibe Zerik/îltihaba kezebê (Hepatitis A ango E)
- Îltihaba çermê mejî ku bakteriyên-Hib zû belav dibe,
- yanî virûs û bakteriyên dibin sedem, virîk û/ango Vereşîn (Tenê ji bo zarokên bin 6 salî derbas dibe)
- Kuxika xeneqîtikê (Pertussis)
- Felca zarokan (Poliomyelitis)
- Sipê ser (ger dermankirina pêwist hê dest pê nekiribe)
- Girû-keno (Skabies)
- Sorik
- Meningokok -Enfeksiyon
- Gurep
- Weba
- Nexweşiya sorbûnê ango enfeksiyona bi bakteriya (Streptococcus pyogenes)
- Tîfo ango Paratyphus
- Sorik (Windpocken, Varizellen)
- Harareta bi virûs a hemorojik (Mînak Ebola)

Tabelle 2: Nexweşiyên ku zû belav dibin tenê bi destûra Daîreya Tendûristiyê û bi agahdarkirina kesên ji zarokan berpirsyar dikarin biçin serdana deverên bi hev re tê bikaranîn:

- Kolera-Bakterî
- Dîfterî-Bakterien
- EHEC-Bakterien
- TÎfo- ango Paratîfo-Bakterî
- Şigelloz -Bakterien

Tabelle 3: Ger di malê de gumana van nexweşiyan hebe serdan tên qede kirin û divê hûn agahî bidin kesên ji zarokan berpirsyar:

- Ê a zirav (tuberkuloz) a dikare zû belav bibe
- Dizanteriya bakterî (igelloz)
- Kolera
- Îltihaba rûviyan (Enteritis), ku EHEC dibe sedem û piştre dibe
- Diphtherie
- Vîrusên A ango E dibe Zerik/îltihaba kezebê (Hepatitis A ango E)
- Îltihaba çermê mejî ku bakteriyên-Hib zû belav dibe
- Felca zarokan (Poliomyelitis)
- Sorik
- Meningokok -Enfeksiyon
- Gurep
- Weba
- Tîfo ango Paratyphus
- Harareta bi virûs a hemorojik (Mînak Ebola)

Rûpele ji 1'î heya 2'an (Çavkanî Înstituta Robert-Koch e û wan bi dilsozî destûra weşanê daye -Instituts; Rewş: 22.01.2014)